

NAWISK

**S'ERHILDANA
ROMANA
KURDÎ LI
DEVERA
DUHOKÊ Û
PEYVEK**

Tehsîn Navîşkî



Ya durist, ev kurtepeyv e ji belavoka festîvala Duhok ya êkê re hatibû nivisandin, lê ji sedemê hinek xalên taybet nehate weşandin. Li vê dirê ez dê dirêjtirê li ser vî tuxmê wêjeyî li devera Duhokê biaxivim.

Heçiyê li dîroka peydabûna romanê li devera Duhokê bizivire, wê jê re xuya be, jiyê wê, dibe negehe bîst û

pênc salan. Tiştê balkêş ew e, hejmara romanên ji pêrar were li devera Duhokê hatîne weşandin, dibe du carî hindî hejmara romanên li bîst û tiştê salên berî hingê bin, tiştê balkêş tir ew e, piraniya romanên li van du salên dawiyê hatîne weşandin, xwediyên wanan, helbestvan û nivîskarên peyvên nazik bûne!

Bi dîtina min, ev serhildana wêjeyî pêdivî têhizrîn û dûvçûneke mijarane. Rast e ev diyardeye, di dîroka pêvajoya çandê cîhanê de, ne tiştêkî hêbetîye!. Lê ji me kurdan re, di welatekî perçe perçe kirî de, tiştêkî hejî û ne dîtiye!.

Ya min divê li vê derê aşkera bikim, peyva kurdî di van baredoxan de sînoran nabezîne, heya nivîserên hemû perçên Kurdistanê verêj û berhemên hev du yê çandî nexwînin. Romana kurdî serpişka van tuxmên wêjeyî yên dikevîne di bazîneyê çandê kurdî de ne.

Ya ji min ve, da gelek baştir be, heger romanên li Duhokê hatîne weşandin, bi tîpên latînî bi çend hejmarekan bihatane weşandin û li ser mêvanên li perçên din yên Kurdistanê ku bi pîtên latînî dixwînin bihatane parvekirin.

Beranber vê êkê, berevajî wanan jî, romanên xwe bi pîtên erebî weşandibane û li ser wêjeyanên de-verên bi pîtên erebî dixwînin belav bikirina, bi baweriya min, li wî çaxî, da peyva kurdî sînorên bi destdanay bibezîne, hîvî û daxwazî ew in, li festîvalên paşerojê, ev pêşniyaz e li berçav bihête wergirtin. pêngava di dûv re, verêjên din yên çandî li pey wî bernamey bihêne alûgorkirin.